



BEYANA RAZÎBÛNÊ JI BO BEŞDARÊN MATCH'IN-PROJEKT'Ê

Nav, Paşnav

Rojbûn

1. Beşdarî

Bi înzeya xwe, hûn diyar dikin ku hûn bi daxwaza xwe beşdarî projeya "Match 'In – Projeya Pilot ya pêvajoya anîna ba hev ya bi piştigirya algorîtmayekê ya ji bo belavkirina kesên li parastinê digerin" dibin. Di çarçoveya projeyê de dê bi alîkariya algorîtmayekê ji nav komunên beşdar yê li Hessen / Niedersachsen / Nordrhein-Westfalen / Rheinland-Pfalz ji bo we komuna herî guncav bê diyarkirin. Dê li gorî van **pêşniyaran** û krîterên din bi riya katibeke/î ji Serokatiya Herêmî ya Darmstadtê / Rêveberiya Qebûlê ya Herêmî ya Niedersachsenê / Rêveberiya Herêmî ya Arnsbergê / Midûriyeta Çavdêrîkirin û Xizmetgûzariyê ya Rheinland-Pfalzê biryareke tehsîsê ji bo komuneke li Hessenê / Niedersachsenê / Nordrhein-Westfalenê / Rheinland-Pfalzê bê dayîn. Ev ne mecbûr e ku komuneke ji aliyê algorîtmayê ve hatî pêşniyarkirin yan jî komuneke beşdarî Match'In-Projektê bûyî be. Ev biryar mecbûrî ye, ango guhertineke din tenê bi riya serlêdaneke li gorî qanûnên heyî pêk tê.

2. Komkirina daneyan

Di çarçoveya projeyê de dê daneyên takekesî ji bo pêkanîna pêvajoya berhevanînê bînin komkirin. Daneyên (ji aliyê Serokatiya Herêmî ya Giessenê ve) tînin berhevkirin li Serokatiya Herêmî ya Darmstadtê / li Rêveberiya Qebûlê ya Herêmî ya Niedersachsenê / Rêveberiya Herêmî ya Arnsbergê/ li Midûriyeta Çavdêrîkirin û Xizmetgûzariyê ya Rheinland-Pfalzê tenê ji bo armanca biryardana belavkirin û tahsîsê tînin bikaranîn û ji bo vê armancê tînin hilanîn. Destûr ji bo bikaranîn û hilanîna ji bo armancên din tune ye. Ev dane dê piştî bidawîbûna dema îtiraza biryara tahsîsê bînin jêbirin yan jî ji bo lêkolînan bînin anonîmkirin. Daneyên hatine anonîmkirin dê ji aliyê Zanîngeha Hildesheimê ve ji bo maweyeke 15 salan daxilî bînin hilanîn. Ev ê tenê ji bo beşdarên projeyê berdest bin. Piştî bidawîbûna projeyê, ev dane dikarin tenê di projeyên şopandinê yê komên lêkolînê yê tînkildar de (Koma Lêkolînê ya Siyaseta Koçberiyê (MPRG) û Koma Xebatê ya Endezyariya Pergalên Nermalavê (SSE) li Zanîngeha Hildesheimê û her wisa Beşa Lêkolînan a Koçberî, Penaberî û Entegrasyonê (MFI) ya FAU Erlangen-Nürnberg) bînin bikaranîn.

3. Lêkolîna pê re

Daneyên tên berhevkerin ji bilî bikaranîna hevberkirinê ji bo projeyên din yê zanîngehê ve jî tên bikaranîn. Daneyên tên berhevkerin di lêkolînan de di forma anonîmkirî de tên bikaranîn, ango tê de agahiyên nasnameyê yê wekî nav, rojbûn yan hejmara nasnameyê nîn in. Her wisa di weşanên ne de jî ev agahî di fomeke wisa de tên bikaranîn ku kes nediyar bin û neyên nasîn.

Em ê di çarçoveya lêkolîna pê re de piştî barkirina we di du xalan de ji we bersivan bixwazin, ango hîsên we yê li ser beşdarbûna projeyê û guncavbûna komuna ji bo we hatî diyarkirin. Pirsyara pêşî dê hema piştî hatina we ya ciyê nû bê kirin. Pirsyara diduyan dê piştî hûn çend mehan li wirê bijîn bê kirin. Beşdariya li van pirsyaran bi dilxwazî ye.

Heke hên bixwazin beşdarî lêkolîn pê re bibin, giring e ku hûn agahiyên xwe yê têkiliyê (hejmara telefonê, Navnîşana E-Mailê) bidin. Ev agahiyên şexsî dê ji daneyên din cuda bî qeydkirin û kesên sêyemîn wê nikaribin xwe bigihînin. Ev agahî dê piştî temambûna lêkolîna pê re bî jêbirin.

Kesa/ê têkildar li Weqfa li Zanîngeha Hildesheimê

Dr. Danielle Kasparick

Universitätsplatz 1

31141 Hildesheim

+49 5121 883-10776

E-Mail: danielle.kasparick@uni-hildesheim.de

Bingeha qanûnî ji bo parastina daneyan:

Em li ser bingeha razîbûna we li gorî Madeya 6an Paragrafa 1ê ya DSGVOyê li ser daneyên kesane yê ku ji we hatine berhevkerin kar dikin. Heke kategoriyên taybet yê agahiyên şexsî jê bibandor bibin (wekî mînak agahiyên tenduristiyê yan jî baweriyên dînî) em van li gorî Qanûna Madeya 9an Paragrafa 2yan ya DSGVOyê li ser agahiyên ji we hatine berhevkerin kar dikin.

Mafên we

Qebûlkerin bi daxwaza we ye. Hûn dikarin pesendkirinê red bikin û wê ji ber vê di pêvajoya we ya penaberiyê de yan jî di karên din yê fermî de ti bandoreke vê ya negatîv negihîje we. Heke hûn vê qebûl nekin, transfera we wê li gorî prosedura normal bê kirin.

Kengê hûn bixwazin hûn dikarin bi Serokatiya Herêmi ya Giessenê yan jî Serokatiya Herêmi ya Darmstadtê / li Rêveberiya Qebûlê ya Herêmi ya Niedersachsenê / ya Weberhaus Nieheimê yan jî Rêveberiya Herêmi ya Detmoldê / Diakonischen Werkê re bikevin peywendiyê û pesendkirina xwe betal bikin. Ji kerema xwe re ji bo vê bi wan kesan re bikevin peywendiyê ku anketên Match'In-Projektê çêkirin. Piştî vê betalkirinê dê kartêkirinên li ser agahiyên we bî rawestandî.

Lê belê betalkirina we bandorê li ser qanûnîbûna kartêkirinê beriya betalkirinê nake. Ev kartêkirin li gorî destûra we qanûnî tên qebûlkerin. Heke Serokatiya Herêmi ya Darmstadtê / Rêveberiya Qebûlê ya Herêmi ya Niedersachsenê / Rêveberiya Herêmi ya Arnsbergê / midûriyeta çavdêrî û xizmetgûzariyê ya Rheinland-Pfalzê jixwe li gorî pêşniyareke berhevanîne transfera we derxistibe komunekê, betalkirin bandorê li vê biryarê nake.

Li ser daxwaza dibe ku daneyên weyên şexsî di formateke avakirî, berbelav û li gorî makîneyan bidin we yan jî kesên sêyemîn. Ev ihtîmal mehekê piştî danezana biryara tahsîsê û piştî dema ji bo îtiraza vê biryarê hatî veqetandin qediya bi dawî dibe. Di vê nuqteyê de dane dê bi renekî ku êdî destûr nade nasîna kesane bî anonîmkirin.

Hûn dikarin li dijî bikaranîna daneyên we bi awayê derqanûnî li ba peywirdarên fermî yê parastina daneyan yan jî li ba rêveberiya berpîrs ya çavdêrîkirinê (Rêveberiya Federal ya Parastina Daneyan û Ewlekariya Agahiyan BfDI) giliyên xwe bikin.

Berpîrsiyariya Parastina Daneyan ya Serokatiya Herêmi ya Giessenê

Berpîrsiyariya Parastina Daneyan ya Rêveberiya Qebûlê ya Herêmi ya Niedersachsenê

Berpîrsiyariya Parastina Daneyan ya Herêma Detmoldê

Berpîrsiyariya Parastina Daneyan ya Midûriyeta Çavdêrîkirin û Xizmetgûzariyê ya Rheinland-Pfalzê

Berpîrsiyariya Parastina Daneyan ya Weqfa Zanîngeha Hildesheimê

Prof. Dr. Thomas Mandl

Lübecker Str. 1

31141 Hildesheim

+49 5121 883-30306

E-Maîl: mandl@uni-hildesheim.de

Razîbûn:

Min agahî û danezaya razîbûnê ya anketa têkildarî projeya "Match'In – Projeya Pilot ya pêvajoya anîna ba hev ya bi piştgiyariya algorîtmayekê ya ji bo dabeşkirina kesên li parastinê digerin" bi temamî wergirtin, xwendin ê jê fêhm kir. Ji min re derfet hebû ku ez pîrsan bikim. Bersiva pîrsan bi temamî hate dayîn. Min kopiyeye belgeya agahdariyê û vê danezana razîbûnê wergirtiye. Tîma projeyê temamê maweya projeyê danezana razîbûnê hiltîne. Ez razî me ku agahiyên min yê şexsî wekî li jorê hatiye diyarkirin, bê berhevkirin, hilanîn û kar tê bê kirin.

Ez bi îmzeya xwe razîbûnê didim ku...

- ...ez beşdarî projeya "Match'In"ê dibim û ez ê li gorî pêşniyarên berhevanîna bo komuneke li Hessenê / Niedersachsenê / Nordrhein-Westfalenê / Rheinland-Pfalzê bêm transferkirin.
- ...daneyên min dikarin ji bo pêkanîna prosedura Match'Inê bêm bikaranîn.
- ...daneyên min dikarin bi armanca lêkolînan bêm bikaranîn.

Cî, Dîrok

Îmze

PÊVEK: PÊNASEKIRIN

"**Agahiyên şexsî**" (pbD) li gorî Madeya 4an Hejmara 1ê ya DSG-VOyê hemû agahiyên têkildarî kesekê/î rastîn (ji niha pê ve kesê bandorlêbûyî) ku pêkan e pê bê naskirin. Kesê rastîn ew kes e ku xwezayî ye û bi awayekî rasterast yan jî nerasterast bi nav, hejmara nasnameyê, ciyê cografîk, hêmaneke nasandina serxetî yan jî hêmanên din yê nasandinê tê naskirin û wateyê nasnameyên wî yê yê fîzîkî, fîzyolojîkî, genetîkî, psîkolojîkî, aborî, çandî yan jî civakî hene. Ev dikare wekî mînak agahiyên derbarê ciyê jiyana kesekî de bin, yan jî derbarê sîgorte yan dahata wî de bin. Binavkirin ne giring e. Ya giring ew e ka rê li hindê vedike ku bizanin ew kes kî ye.

"**Kategoriyên Taybet**" yê agahiyên şexsî li gorî di Madeya 9an Paragrafa 1ê ya DSGVOyê ev agahî ne ku "binyada nijadî û etnîkî", nêrînên polîtîk, baweriyên dînî yan jî îdeolojîk yan jî daneyên endamtiya sendîqeyê diyar dikin, her wisa xebata li ser daneyên genetîkî, agahiyên biyometrîk yê kesekî xwezayî pênase dikin, agahiyên tenduristiyê yan jî jiyana zayendî yan jî meyla zayendî ya şexsekî bi zelalî didin xuyakirin.

"**Agahiyên Tenduristiyê**" li gorî Madeya 4 Hejmara 15 ya DSGVOyê ew agahiyên kesane ne ku têkildarî tenduristiya fîzîkî/derûnî ya kesekî xwezayî ne ku dabînkirina xizmetên tenduristiyê rewşa tenduristiyê jî heye.

"**Kartêkirin**" li gorî Madeya 4an Hejmara 2yan ya DSGVOyê karên yan jî kiryarên bi alîkariya yan jî bêyî alîkariya pêvajoyên otomatîk berhevkerin, tomarkerin, organîzekirin, bipergalkirin, hilanîn, lêanîn, guhertin, xwendin, nirxandin, bikaranîn, veguhestin, belavkirin yan jî bi awayekî din pêşkêşkirin, danberhev yan jî yekkirin, kurtkirin, bi jêbirin yan jî tune kirinê îfşakirina têkildarî agahiyên kesane ne.

"**Anonîmkirin**" guhertina daneyên şexsî ye ku agahiyên şexsî yan jî agahiyên şexsî yê têkildarî rewşên fiîlî êdî nikarin bo kesekî diyar yan jî kesekî nasnameya wî tê diyarkirin bîn veguhestin yan jî tenê bi rêjeyeke bêhevseng ya demê, lêçûnê û hêza mirovî bo kesekî diyar yan jî kesekî nasnameya wî tê diyarkirin bê veguhestin.